

3000 kes ji bo mafê Êzîdiyên başûrêrojawa meşiya

Ji bo şopandin, lêpêşgirtin û nerazîbûnê li hemberî hevpeymanê Almanyayê û Sûriyê di 20ê sibatê de li Elmanyayê, bajarê Hannover li qada Steintorê nêzîkî 3000 kes ber bi avahiya Parlamentê Herêma Niedersachsen ve meşiyên. Sloganên li dijî biryarên derxistina Êzîdiyên başûrêrojawa û helwesta dewletê li dijî kurdên penaber yên Êzîdî hatin bilind kirin.



Ev meş bi organîzekirineka gelek profesyonel, gelek hêmin, li ser navê Encumena ÊzîD hatibû qeydkirin û ji aliyê EziD û “Komîta şopandin û lêpêşgirtina peymanê Sûriyê-Elmanyayê” hatibû amade kirin.

Di destpêkê de nûnerê komîteya Êzîdiyên başûrêrojawa, “Komîta şopandin û lêpêşgirtina peymanê Sûriyê-Elmanyayê” û moderatorê meşê rêzdar Dilgêş Îsa li ser rewşa Êzîdiyên başûrêrojawa (Sûriyê) axivî û rexne li peymanê Sûriyê û Elmanyayê kir.

Herweha di çarçova Xwepêşandanê de gelek dost û hevalên mîletên bindest amade bûn.

Xanim Pea Beate Zimmermann, endama partiya PDS, û xanim Filiz Polat ji Partiya Keskan (Bundes 90, die Gruenen) û herweha rêzdar Sigmar Walbrecht ji encumena penaberîya Niedersachsen (Flüchtlingsrat Niedersachsen) di axiftinên xwe de piştgiriya xwe ji bo doza penaberan diyar kirin û destxweşî dane beşdarvanên Xwepêşandanê.

Hêjayî gotinê ye ku hêja Felekna Uca, endama Parlamentoya Ewropayê ku bi eslê xwe Êzîdî ye, wek hercar cihê xwe di nava gelê xwe de girt û di axiftineke bi heyacan fikir û dîtinên xwe derbarê vê peymanê anî zimên.

Her weha serokê encumena EziD birêz Loqman Bariş di axaftina xwe ya pir balkêş de bal kişand ser giringî û pêwîstiya tifaq û yekîtiya navxweyî, û got ku îro roj di van rojên dîrokî de, di van kêlîkên pir hestedar de em bêtir ji hemî demê bi hewcedarê yekîtiyê ne.

Di heman demê de, berê xwe da wan kesayetên ku li dijî tifaqa Êzîdîyan kar dikin û got ku em ê qet bi tu awayî rê nedin ewan kesan kî bin bila bibin, û em ê her demî li her cihê ku em tê de bin riwê wan yê reş rayî mîlet bikin.

Ji layekî din ve birêz Bariş Êzîdiyên başûrêrojawa (Sûriyê) rexne kirin û got ku eger hun li xwe nebin xwedî eger hun tifaqa xwe bi destên xwe çênekin, wê kesek jî wê çaxê nikaribe alîkaria we bike, û li pirs û pirsgerêkên we xwedî derkeve.

Hêjayî gotinê ye ku ji bo serîlêdana hindêk cihên fermî yên Elmanya, di meşê de du şand hatin destnîşankirin û berê xwe dane avahiya perlemanê herêmê û avahiya wezareta hundir, li wir herdu şandan daxwaznameyek firehî radestî Hikûmeta Herêmê û hemî partiyên Elmanî yên Herêmê kirin, û hêviya xwedîderketina li Êzîdiyên başûrêrojawa li wan kirin.

Di 14.07.2008 an de Dewleta Sûriyê û Elmanya peymanê vegerandina penaberên ji Sûriyê hatin yan jî yên di rêya Sûriyê re hatin Elmanya, îmze kirin. Di 03.01.2009 Hikûmeta Sûriyê ev peyman bi rengekî fermî pejrand.

Dewleta Elmanya hewl dide nêzîkî 7000 Penaberan vegerîne Sûriyê. Ev Penaber ji salan ve li Elmaniya dijîn bêyî ku Elmaniya mafê Penaberiye bide wan. Piraniya van penaberan Kurdên parêzgeha Hasaka ne û hijmara bihtir ji wan ne Hemwelatîyên Sûriyê ne.



Demjimêr li 14.00 an piştî nîvro bi dilxweşî û serkeftinek pir mezin meş bi dawî hat, û beşekî mezin ji xwepêşînderan berê xwe dane mala Êzdiyan Celle.

Li mala Êzdiyan Celle civînek li ser heman babetê bi beşdarbûna nûnerên Bundesamt, seroka şaredariya Celle, birêz Felek Naz Uca, gelek parêzvan û bêtir ji 300 kesî hate li darxistin.

Di wê civînê de ku bêtirê wê şîrove û pirs û bersiv bûn pişkdaran bal kişandin ser rewşa Êzdiyan li

Turkiyê, Sûriyê, Elmaniya û xetera peymanê di navbera Sûriyê û Elmanyayê de.

Têklî bi: Komita Hildesheim ya şopandin û lêpêştgirtina peymanê Sûriyê-Elmanyayê
www.yeziden-syrien.de - yeziden-syrien@hotmail.de ...

Zarathustra News - zarathustra_news@comhem.se